

Hevpeyvîn bi rêzdar

Ibrahîm Guçlu-Sekreterê TEVKURDê re,

Ibrahîm GUÇLU Kî ye?

Ew kurdekî Anadoluya Navîn e, sala 1949an li gundekî nêzikî Enqereyê, li gundê Hacıya hatiye dinyayê. Di dibistana navîn de, bi tesîra du mamosteyên kurd ramana neteweyî kurdî pêre çêdibe, ji sala 1967an ve, wî dest bi xebata siyasî kiriye, beşdarî di xwepêşandanên kurdan de kiriye, di heman salê de (1967), dibe xwendevanê zanîngeha Hiqûqê ya Enqerê, karê siyasî di partiyeke çep a tirk de dike. Ji bona ku ew damezirêner û serokê DDKO yê bû, digel çend hevalên xwe (Mumtaz Kotan, Sebrî Çepîk, Nezîr Şemîkanli, M. Emîn Bozarşan, Musa Enter, Dr. T. Zîya Ekîncî, Canîp Yıldırım) li Enqereyê sala 1970, 8mehan dikevin zindanê. Sala 1971ê, ji ber kurdîtiyê careke din ew tê girtin, 4salan di zindanê de dimîne. Di rêxistina Rizgarî, paşê Ala Rizgarî de xbatê dike. Sala 1987an li Swêdê cîwar dibe, sala 1998an careke din ew vedigere welêt, di partiya (DKP), (Hak-Parê) de kar dike. Vêga, ew sekreterê TEVKURDê ye.

Li destpêkê, bi navê weşana NEWROZ a ku bi zimanê kurdî li Sûriyê tê weşandin, em xêrhatina we dikin. Bêgomane, em xwe bi pêdarî û berxwedana we di ber doz û zimanê kurdî de bextiyar û serbilind dibînin, ji ber ku zimanê me, nîşan û sembola hebûna me ye.

1-Pirsa me ya pêşîn ew e ku hun TEVKURDê bi xwendevanên NEWROZê bidin naskirin. Ev sazî ji bo çi û kengî ava bûye, armancên wê çine, rêvebirîya wê çawa dibe...û hwd?

1-TEVKURD, kurtenavê me ye. Navê me yê vekirî “**Tevgera Yekîtiya Neteweyî ya Kurd**” e. TEVKURD, tevgera yekîtiyê ye.

Xebata TEVKURDê di 4-ê îlona 2005-an de bi konferanseke rewşenbîr û siyasatvanên Bakurê Kurdistanê li serekbajarê dewleta kolonyalist a Tirkîye Enqereyê, bi avabûna “**Gruba Xebatê**

ya Neteweyî û Demokrat a Kurd” (**GRUBA XEBATÊ**) dest pê kir.

Gruba Xebatê di 27-28. 12. 2005-an de civîna xwe ya fireh û giştî li Kurdistanê û li Bajarê delal Amedê, vekirî, di saloneke otelekê de pêk anî. Di vê civînê de biryar girt ku navenda xebatê, Kurdistan û Amed be. Di encama civînê de ji bona ku yekîtiyeke siyasî ava bibe, biryara pêşxistina xebata xwe da û deglerasyonê ji reya giştî re pêşkêş kir.

Ez, ji bona ku TEVKURDê baş bidin naskirin, ez dixwazim ji GRUBA XEBATÊ bi kurtî be jî behs bikim.

Wateya peyva “yekîtiyê” gellek vekirî û xuya ye. Dema ji yekîtiyê tê behs kirin, wê demê tê wê maneyê ku hêz û parçeyên cihê hene, gerek ew hêz û parçe bibin yek. Dema ku ji yekîtiyê tê behs kirin, dîsa gelek awayên yekîtiyê tên bîra mirov. Wek mînak, yekîtiya millet û gel, yekîtiya miletan û gelan, yekîtiya dewletan, yekîtiya siyasî, yekîtiya partîyan, yekîtiya neteweyî, yekîtiya civakî. Şirketên aborî jî, yekîtiya sermayeyê û maldariyê ye. Konfederalîzm, yekîtiya dewletan e. Federalîzm, yekîtiya herêmên neteweyî û desthilatdarî ne. Enî, yekîtiya partî, grûbên siyasî, kes û hêzên xwediyê hevarmanc in. Mirov dikare bibêje ku di civatên modern de jiyan li ser hevbeşbûn û yekîtiyeke plural dimeşe. Yekîtiyê, ji bona serkeftin û mezinbûnê jî konseptek e.

Miletê kurd li hemû beşan ji bona ku rizgarî û azadiya xwe bibe serî, hewcedarî yekîtiya civakî, siyasî û wekî din e. Ev rastiya ji bo Bakurê Kurdistanê jî derbas dibe. Ji bona vê yekê, di çil salên jiyana min ya siyasî, entellektûelî de peyva ku min zêde bihîstiyê û bi kar anîye peyva yekîtiyê ye. Ev jî derdixe holê ku yekîtiyê hewcedariyek e.

Li Bakurê Kurdistanê, ji bona yekîtiya siyasî, an jî ji bona awayên din yên yekîtiyê gelek kar hatine kirin. Di van yekîtiyan de aliyên biserketî bûne, aliye biserneketî bûne. Lêbelê gerek mirov aşkere bike ku di yekîtiyê de kurdên Bakurê Kurdistanê bi giştî serkevtî nînin. Li beşên din yên Kurdistanê jî yekîtiyê wek pirsgirêkekê li holê ye.

